

# Welat

Welat

Hejmar (4)  
5 Elûn 2013

Candî - Giştî - Serbixwe - Nîvmehane



welat.press@gmail.com

[www.facebook.com/Dengekurdistanasurya](https://www.facebook.com/Dengekurdistanasurya)



## Welat ji belangazên xwe vala dibe

Koçkirina komî ya kurdên rojavayê Kurdistanê ku ji 17 -7an ber bi herêma kurdistanê ve bi vî rengê balkêş çêbû , tiştekî tenê anî bîra me û ew koçkirina komî ya kurdên başûrê kurdistanê di salêن nofî de ber bi Tirkiyê ve di dema şerê dektarorê Iraqê Sedam Hisêن de dijî wan, ew dîmenêن ku cîhan tev jîbîr nake li rojavayê kurdistanê êdî dubare bûn û bi wê dubaekirinê re birîneke kûr di laşê vî parçeyê biçûk ji kurdiatnê vekir.

Ev koçkirina komî ji rojavayê kurdistanê ku gelek sedemên wê hebûn û di serî de êrîşen ku ji aliyê girûpen Islamî yên radîkaî li ser herêmên kurdî li Sûriyê pêk têن û xwîna wan helal dikin û dor-pêçkirina li ser herêmên kurdî ku bidestxistina türkekî nan kiriye xewnek û demjimêrek bi elektrîk bi ti buhayî nema tê kirîn.

Hember vî rengî ji valabûn û valakirina herêmên kurdî li Sûriyê ji xwediyyêن xwe, mana li ser qadê û girêdana bi wê daxwaza herî giring û bingehîn e lê xwesteka vê yekê ji kesên ku dev ji mal û xizm û mirovên xwe berdidin rengek ji dînbûnê ye eger sedemên koçkirina wan neyên çareserki

rin, helbet û bo pêkanîna xwestekên kurdên rojavayê kurdistanê da ku ji wisa bêtir koç nekin û dev ji xaka xwe bernedin tê xwestin ku saziyên navnetewî dengê xwe di rûyê van êrîşen ku li ser hermên wan têن kirin bilind bikin û karekî bi lez bo vê yekê bikin, li aliyekî din jî divê ev saziyên navnetewî û di serî de yên mafêن kê mirovan alîkariya herêmên kurdî bikin ji be rev herêm ji alîkariyên wan bê par in û divê ev sazî doza vekirina sînorêن gîfî li hemî aliyê rojavayê kurdistanê bikin da ev herêm ji xwediyyê qadê vala nebin û kirîa wan mezintir nebe . Di tûrikê her penaberekî ji wan hezarên ku me wan di dmena xemgîn de ku bi herêma Kurdistan ve koî dikin, dît, komek ji birînan hebû hin ji wan birînen gera li jiyan û aramiyê dûr ji şer û helalkirina xwîna kurdan û di tûrikê hinek din de gera li pariyek nan û jiyanekî hinekî bi rûmet, birînek wisa çiqasî bê derman bimîne ew dîroka kurdan li rojavayl kurdistanê bêtir birîn dike .

**Aras Yûsiv**





## Kolan ji xwînê têr bûn .. ..... hema bazîrgan têr nebûn

Gava ku piraniya miletê Sûrî, bi pêkhateyên xwe, dakete kolalnan û siloganên mîna " em azadî û demokrasiyê dixwazin .. me divê jiyanekî bi romet .. " bilind hildan, wê gavê gewriya milet hate qurincandin, û pişt re sîngâ wî hate gulebaran kirin, ta li sernserî welêt pirsa azadiyê bû weke sembola herî mezin, û rûxandina rijêmê wek erk û stûbarieke girîng û pêwîst hate destnîşan kirin, tevî ku, li şûna xwepêsedanên aştiyane dengê top, tang û balefiran, û her weha komkuji, wêran û awarebûna xelkê, bûne naveroka jiyana hemwelatiyan .. lê hêviyên milet mane girêdayî bi paşerojeke azad, ji ber ku piraniya welatên hawîrdor û dûr jî, xwe weke dostê şoreşê binav kirin, û soz û peymanên alîkar bi şoreşê re roj dû rojê bêhtir û zêdetir dibûn, lê mixabin.. piştî ewqas qurban û ewqas talan û wêrankirin, hate xûyakirin ku ew dost, bazîrganên astengiyan bûn, û berjewndiyên welatên wan ji her tiştên din bilind tir û mestirin, ji ber wêjî pêvajoya şoreşê ber bi astengiyê ve cû.. ev gotinên jorîn, bala mirov dikşîne ser xaleke herî girînig, ew jî ew e ku rêvebir û karbidestên şoreşê, ne xwedî nerîneke stratîcî bûn, û xwendina wan ji qonax û bûyeran re qels û çewt bû, ev ji alîkî de, û ji aliyê din de, gelek ji kesen ku di hembêza welatên hawîrdor de, xwe wek şoresser pêşinyar kirin, bûne kelem li pêsiya pêşveçûna milê siyasî ji şoreşê, ji ber ew kes ketin bin bandor û kontirola wna dewletan, û ji wan hate xwestin ku projeyên ew ê dewletê bi serxe, ango, bûne bar û giranî li ser şoreşê, û roj bi roj bûne kelem li pêsiya ci gaveke bê avêtin di riya pêşveçûnê de, ji ber mane girêdayî bi "kursî" û berjewndiyên taybetmend de..

Li gorî vê rewşa han, şoreşa sûriyê kete metirsiyeke dijwar û bive de, ji ber valahiyek di asoya armancan de pêk hat, ev ji alîkî ve, û ji aliyê din ve, her pirojeyek hirêmî an navnetewî, dixwaze wê li gora xwe tîmar bike. Wan pirojeyan hêşt ku dezgehêن bingehîn ji şoreşê re şerpeze bibin, û ev ê yekê jî bandorek bi girêt li hewildana xelkê sivîl kir û destê wî bi gûrkirina şerê navxewîyî girêda " êlî, olî, olperestî û nijadperestî" tenê bazîrganên şoreşê dest berdayî man û li vir û li wir, li çep û rast lê xistin û lêdixin, bêyî ku xûna li kolanan di bîra wan de be... mixabin, ev bixwe jî xwesteka rijêmê ye.

**Ronî Eli**

## Niştîmanprwerî (welatparêzî)

Heskirin û parastina xaka welat û berevanî ,jêre dibêjin niştîmanperwerî, niştîmanperwerî ew hestênu ku dinava hezarê salan de peydabûne ji ber cudabûna welatan û girêdana mirov bi cih û warê dayikbûna xwîve, bi ziman û dîrok û bîr û baweriyê netewa xwîve .

Li gor vê pênasîna niştîmanperweriyê em karin ci bêjin di derbarê niştîmanperweriya kesê kurd de ji bo welatê wî? Û wê çawa ew niştîmanperwerî li cem pêkwerê? Ji bo persiva vê pirsê, sisê tişt hene divê li cem wî peyda bibin û çêbibin:

1)bawerî 2)viyan 3)cangorî

1)bawerîya kesê kurd hebê ku li ser xaka xwe dijî û kurdistan welatê wiye û zimanekî wî teybet heye û xwedî dîrok û bîr û bawerî û çand û hine re ,û heta ev bawerî li cem peyda bibê bi xwertî divê li dîroka xwe vejerê û bixwînê û fêrî zimanê dayikê bibê ji bo çîrok û tor û çand û hinera xwe binasî.

2)viyan :ew tiştê dinava mirovdê pêktê da ku bi şiyarî û zabe-bûn kar û barê xwe bi aliyê serkeftina armanca

xwe ve bibê ,bawerîya kesê Kurd bi welatê wî û bawerya wî bi serkeftin û rizgarkirin û serxwebna Kurdistanê viyaneke xwert li ba wî



çêdikê, ku herdem amadebê ji bo kar û xebat û doza welatê xwe

3)cangorî ewe ku mirov amadebê ji bo pêşkêşkirina tiştê herî buha li ba wî ji bo bighê armanca ku ew dixwazê bê oh û toh .

Ev hersê tiştê me anîn ziman , têkiliyek xwert di navbera wan de heye , cangorî bê viyan nabê û viyan bê bawerî çenabê .

Gelo ev hersê tişt li ba Kurdên rojava peyda dibin di roja iro de yan na?! Û heger peyda nabin , wê çare çawa be di nerîna te de xwendenvanê xweşewîst??!

3/7/2013

**Lazgîn dêrûnî**





## Rêbereki kurd li Rojavayê Kurdistanê

Mafnas cudabûna di navbera rêber û serokan de nas dikan, bi kurtî rêber di heman demê de serok e, lê serok dimîne pêdiviyê gellek rûdariyan ta ku bibe rêber, gellek merc, hemserî û karînan. Serok, weke rêber li cihê berpirsiyariyê ye, desthilatiyê xwe ji yaseyan distîne, ji cihê xwe, nagihêje rêber yê ku desthilatiyê xwe ji civakê distîne, ji hezkirina civakê. Rêber dikare seqayê têgihiştin û hevgirtinê di nav civakê de biafirîne, dikare bandorê li civakê bike, li dîtin, bawerî, jîwarî û siberoja civakê. rêber xwe ji millet dibîne, bi civakê re, bi êş, şahî, tengahî û firehiya millet re, ew kurê civakê ye, rêbertiya rêber encama hezkirina millet e. Guhdariya millet ji rêber re bingeha wê pejirandina millet e, berûvajî serok yê ku guhdariya civakê ji yaseyan distîne, di nav milletê Rojhilatê de ji temenê xwe, yan ji bûyerên awerte. Serok bi van wateyan gefek e li dijî berjewendiyê civakê. Ferman û bîryarê serok pêdiviyê yaseyan e, bêhtir ji yên civakê, berjewendî û hêviyên endamên civakê... Serok bi wateya xwe ya bûrî li Rojavayê gellekî peyda dibin, tu dikarî bibêjî ku hemî kurdên Rojavayê serok in, yan xwe serok dibînin, lê ci qasî rêber li Rojavayê hene?!! Ci qasî milletê Rojavayê pêdiviyê rêberan e, yan hema rêbereki?!! Ev e ramana girîng. Rêbereki ku rêbertiya gel bike, ber bi siberojeke rengîn de, ber bi mafê gel yê rewa de û wî biparêze ji agirê ku li seranserî Sûriyayê vêket û, ji birçibûn, penaberî û perîşaniyê. Li Rojavayê partî bi serokên xwe nûnertiya milletê kurd dikan, civaka kurdî, li cihê berpirsiyariyê. Partiyênu ku nikarin rêbereki çêbikin, bi qasî doza kurdî, bi qasî êş û xweziyên milletê kurd. Ev bi xwe alûziya partiyen e, alûziya milletê kurd e, doza kurdî di encamê de... Rêbereki ku milletê Rojavayê li derdora xwe kom bike û bi xewnêñ wî ber bi sibehê de biçe, rêber be, ji êşa millet, bi hemî rûdariyê



rêberan, bi bawerî, bi vîn, berûvajî berpirsiyarê partiyen, yan serokên partiyen, yên cuda ji milletê xwe, yên ku xwe ji milletê xwe nabînin, weke ku xwe bi ser de. Partî, yan serokên partiyen bîryarê xwe, ne ji vîn û pêşkiya milletê Rojavayê distînin, yan weke xwendinekî ji pêdiviyê milletê Rojavayê re, ew sîka berjewendî û kesayetiyê xwe ne. Ev serokê partiyen gefek in li dijî doza milletê Rojavayê, li dijî berjewendî, xewn û hêviyên milletê kurd, li Rojavayê... Serokên partiyen nikarin bibin rêber ji milletê xwe re, mercen rêbertiyê li cem wan peyde nabin, ne ji dîtin û baweriya rêberan. Xewna millet e li Rojavayê ku rêbereki xwe bibîne, weke rêberen kurd li Başûr û Bakur, lewra gudariya milletê Rojavayê, tîbûna wî ji rêbereki re, wî ber bi Bakur û Başûr de dibe, ji wir rêberan ji xwe re dibijêre, xwe dispêre wan, bi guhdarî û nerînên xwe, bi hezkirina xwe... Kurd, li Rojavayê, vê demê, bêhtir ji hemî deman pêdiviyê rêbereki ne. Ez dixwazim vê bibêjim. Rêbereki bijartî, cuda bi rêya karê xwe, bi dîtin û baweriya xwe, rahêje barê millet, bi baweriya millet, bi êş, bi berpirsiyarî û karî be bi qasî doza millet be, bi wî re, karî be hevgirtin û têgihiştinekî di nav de ava bike, ber bi xewn û dîtinêñ wî de, dengê millet be, dengê doza millet be, ne dengê partiyen xwe, yan berjewendiyê partiyen xwe. Ez dixwazim bibêjim ku ji serokê partiyen tê xwestin ku rêberê gelê xwe bin, bi rûdarî û baweriya rêberan bin, bi méraniya rêberan. Ez ê bibêjim: Rêberêkî weke rêberen kurd li Bakur û Başûr, ji Rojavayê, li Rojavayê gereke...

**Ciwan Nebî**






# Nav..Nav

Îro bi hesanî ez dikarim xwe bi nav bikim: Nivîsakir im, rexnevan im, bîryar im, rewşenbîr im... Ma ci û ne ci weku hatiye gotin. Bi hesanî ez dikarim xwe bi nav bikim, di rîya bendîtyikê re, ku ez û hinek bi zanetiyk taybet hev buxrînin xurandinek lêhatî, ku dunya li ser vê yekê ava bû ye. Îro bi hesanî ez dikarim malperekê ji xwe re amedebe-kim" az yan hinek ji vê pirsê re ku gelek xurtin", ku ez bibme xwedî denk, bi rîyên ku hatine nasîn, daku ez bi nav bibim li ci civata hunerî an çandeyî, an ta ya siyasî, taku ci kesê bi nav dibe an bûye xwedî nav li paş bimîne.

Eger jî min re bibirse: Ma ev karê ku tu dikî duriste? Ez ê bîbeşîm, di peyre ez ê bikenim û bikenim taku zik bi min ve nemîn, taku ew mendehoş bimîne, û ez ê bersivê bidim: Oooh delalo û hevalo, ez dikenim çîmkî weku tu nîzanî dunya çawa hatiye nasîn. Ma ne Qabil Habil kuştîye, û ka çibû tu bi xwedayê xweki? Dunya bi navê wî ma tapo kiri! Ma tu kesî hesab pêre kiribû? Tu dizanî bê kê bi nav dikim, mebest ku ez davêjim kû de. Îca îro çend Qabil hene? Em ê vê yeka hanê li ser me kurdan bi nav bikin. Ma divabe em van kesan bi nav bikin? Dibe ew Qabilê yekem bi wateyek din binase, lê ya ku ez jê bi gomanim xweş goman, ya ku ez di behweriya wê de me, ew e ku Qabilê me kurdan ber bi çavîn. Îca de ka tu bi xwedayê xweki tu dikarî van Qabilan bijmîri hêêê?! Çend Habil têne kuştin daku Qabilek bi nav dibe? Çend Habil, her kîliyek, bi hev re têne girêdan daku Qabilek derkeve bi navê wan, û bêne jibîrkirin? Îca xwedê ji te razîbe tu li kû de dimînî hêêê?!



## Rewş dubare dibe

Aloziya rewşa herêmên Kurdî li rojavayê Kurdistanê ji bandora rewşa abûrî bi taybetî hatiye,

Û ew jî ji xirabiya rewşa Sûryayê bitevahî ye.

Buhaya pêdiviyêne sereke yên jiyanê li sûka Qamişloyê bûye çîroka rojane ya xelkên bajêr.

Ew buhayî jî gelek sedemên xwe jî hene:

Bilindbûna Dolarê sedema sereke ye ji vê (xelayê) re..ji ber ku Ley-reya Sûrî gihaye asteyeke nizim hemberî Dolarê ,û ew jî tiştekî normal e, eger mirov li welêt binêre ku di rewşa şer de ye û karên çekdarî bikar dihîn ji hêla gelek hêzan ve, rîjîm ,artêşa azad, komên

Ez dixwazim bibme xwedî nav, û divabe ez xwedî nav bim, daku ez jî tizbiya xwe ya dirêjî dirêjî berdim nav van tizbiyên kurdî ku pirr bûne. Ez vê yeka han bi kerb dibêjim çîko hinekan , dibe gelek bin, dane pêşıya min, Îca ji mafê mine ku ez bidme xwe, taku navê min pêşıya hemî navan be, taku tu kes nema karibe xwe di min re derxîne. Eger tu ji min bipirsî: Îca ev çiye? Ez jî te re derziyê bi dar vekim, ku ev ne zîrîkiyeke, na! Ev hinek guhbelbûnek, hinek xweşîfînkirinek, hinek pesn ji yên ku bûne rîber û seydayê vê yekê, hinek durûtî û ziman ku îro ew bû ye mîtodek ji dengvedanê re, hinek gotinê qelo ku balkêş bin....Hud.

Îro bi hesanî dikarim tu kesî li pêşıya xwe nehêlim, daku ez çawa bilişim an bîhna xwe berdim û bikşînim bêm dîtin û nîşankirin valî walî. Îca ya ku ji hesanîtir tune ye ew e: Rîyên ku te bi nav bikin, ji wan alavan pirtir tune ne, weku min ji tere gotiye: Bes tu xwe bilivînî li ser vê mebestê, cavê xwe bigre û veke tê xwe bibînî hember navê ku te xwestiye, hema ez yek ji wan kesê ku di cih de ez ê li te mikur bêm û belav bikim ku weku te xwestiye, helbet û ez vê yekê dibêjim, çîmkî ez di misogerîya ku tu jî wisa bi min re vê yekê bikî. Îca ku tu nebî Qabilek tu kes guh nadê te, îca Qabileya kurdî berztire û heq tîne. Hema ji vir de ez û tu bûne xwedî nav !

## birahîm mehmûd

çekdar ên ku ne di bin navê artêşa azad de kar dikin û gelek komên din hene ên ku ji bo diziyyê rahêjtine çekan . û ew hemû hêz bûne sedem ji reweşa xirab re ya ku ji Sûryayê re bûye navnışan.

Lê ku mirov li herêmên Kurdî binêre bi şêweyeke taybet, mirov dê bibîne ku kesin hene dixwazin ku rewşa van herêman xirabtir bibe ,û kar dikin ji bo vî tişti. û mebesta wan a ku tê xuyanîkirin derçûyîna xelkên wê li derveyê welêt, û bi taybet jî mirov kare bibêje miletê Kurd.

Û ev ne tişteke nû ye ku mirov hinekî vegere paş û di dîroka Sûryayê de ya nêzîk mijûl bibe ku ev karê han rîjîma Ba'as dikir da bajarên Kurdî ji xelkên Kurd vala bikin û li şûna wan xelkin Ereb bi cih bikin (tiştekî wisa Zinara Erebî dihêne bîra mirov).

Anîha kesên ku bajarên Kurdî dorpêc kirine,mixabin, ew kesên ku bi şoreşa azadiyê rabûne ,û xwesteka wan roxandina rîjîma diktator û kevneperest e,em qala ew çekdarên ku bi navê Artêşa Azad dikin.

Tenê pirseke û ev piris a tevahiya miletê Kurd e, mirovên ku daxwaziya Azadî û jiyanekî bi rûmet dikin, ne gerek e ku vî tişti ji hemû miletên ku di Sûryayê de dijîn bixwazin?

An jî ji wan re helawê ye û ji Kurdan re totîme ye???

**îmad Talatî**





## >> Rewşa Abûrî li Serê kaniyê xirab dibe

Rapor : BaranWaşokanî

Serêkaniyê wek hemû bajar û bajarokên Sûriyê gazinan dike, ji ber bihabûna pêdiviyêni jiyanê yên bingehîn, nexasim ku meha rojiyê bi giraniya xwe, bi ser hemwelatiyan de hat, bi taybet ji ber tinebûna karanîna kirîna van pêdiviyen.

Ev giranî metirsiyekê dihêne holê , metirsiya koçberî û derketina xortan derveyê welêt. Bihabûna pêdeviyan bêhûde bilind dibe, ev bihabûn ji sibê ta êvara tê guhertin.

Kovara me Welat, li ser vê mijarê, hin hevpeyîn bi xelkê Serêkaniyê re kir:

- Mamoste Idrîs vê bihabûna han vedigerîne gelek sideman:

1- Daketina buhayî Lîreya Sûrî li hemberî Dolarê.

2- Nerazîbûna bazirganan, di firotinê de, bi qezenza hindik.

3- Dirêjbûna rîza bazirganî di firotina pêdivyan de, û ji ber wê jî gelek alî li qezenza xwe digerin li ser mafê welatiyan.

4- Qelsbûna rewşa sinetkariya Sûrî di vê demê de.

5- Bilindbûna buhayê sotemeniyê di çarçova rewşa ewlekariya xirab de.

Di vê rewşa hanê de, yê ku baca buhabûnê dide, tenê hem welatî ye .

- Birêz Îsa vê bihabûnê vedigerîne bihabûna dolar û tinebûna çavdêriyek deshilatî li ser bazaran, û bazirgan jî li gor kêtû mercên xwe kar dikin, bê ku li ti çavdêriyekê vegere .. Îsa tekez dike ku aliyê desthildar di bajêr de ew berpisin li ber vê rewshê.

- Birêz Mesûd kesekî sietkare û li ser gotina Îsa tekez dike û zêde dike ku ev ne tenê êşa Serêkaniyê ye, lê belê rewşa hemû bajar û bajarokên Kurdan e ku di vê zehmetiyê de derbas dibe. Roj bi roj bihabûn li bajêr zêde dibe û ew ê xelk bighêne radeyekê ku li pêdeviyan binerin û nikarbin bikirin ji ber bêrik vala ne .

### Kobanî û hewlidanê damezrandina saziyên civaka sivîl

Bajarê kobanî ji ewan bajarênu ku ji rojê destpêkê de, biryara xwe li aliye şoreşê destnîşan kir, û li gora ew ê biryarê pêvajoya rewseke nû rist û hûnand..

Di hembêza çalakiyên ku li gorî stûbariya karê şoreşê dihatin lidarxistin, çalekvanê kobaniyê gihane wê baweriyê ku pêdîvî ew e başeroj û avakirina welatekî şareza bibe armanc û têkeve ber gengeşîyeke rojane, ji ber wê jî, çalekvanan doza avakirina saziyên civaka sivîl ji xwe re wek erek naskirin, û li ser wê baweriyê civîn û komcivîn hatin lidarxistin ..

Îro li kobaniyê mirov dikare bêje ku bingeha gelek saziyan hatiye binav kirin, kêm-zêde, ew bi hinek kar û çalakiyan radibin, ji wan saziyan, Hiro, ya jinan e, Siba, Dem, berçav, û hinê din.... Û li gel wan jî, hin kombend jî hene, weke kombenda mamosteyan, endizyaran, pijîşkan .. lê ya herî çalekvan parêzerin, ji ber ku karê wê heftane ye, ew heftê carekê di sendika parêzeran de weke mijarekê ji axaftin û diyalogê re binav dike û dikeve ber bas û lêkolinan ..

Hêjâyî gotinê ye, ku ev dezgehêne binav kirî bi tev de serbixwene .



### Xewnêñ zarokêñ Amûdê

Di nav tirabêlka kolanêñ amûdê de,pêxwas, û bi cilêñ xweyî peritî, piyase dikin. (zarokêñ Amûdê)ew jî mîna bajarê xwe bê par mane ji xweşyên jiyanê.

Yarîgeha wan kolan û sîkak in ,û yariyêñ wan jî ,tîreke avêtiye,û çend potêñ kevin bûkekê pê çê dikin ,yan topeke teqyayî ye ,li cadan pê dilîzin.

Ne cîheke taybet heye ku têde behreyêñ xwe bi karbînin,û ne bexçakî zarokan ku tê de bêhînvedanekê bikin û gelek caran,ji ber bûna wan li ser cadan ,rastî rûdawêñ trafîkê dibin û dibne qurbanî. Ciwan kurekîsaliye em pêre axivîn ,û ji mere got:ez di xwazim ku

yarîgeheke top apê li bajarê me hebe,û hêviya min di ayinde de ku bibme yarîzanekî bi navûdengî topa pê.

Sîmav jî kiçike 9 salîye dibêje:ez dixwazim ku parkeke zarokan hebe ,têde bi hevalêñ xwere bilîzim.

Awatêñ wan bi babîsokêñ payizîre difrin ,û xewnêñ wan li ber dergeha hejartiyê dişkên.

Kesûkarêñ van zarokan ,xem sarin liber rewşa ku zarokêñ wan têde dijin ,yan jî tu çare di destê wande tuneye.

Tu kesî ji xwedyêñ Amûdê hewl nedaye ku zarokêñ xwe ji vê doxê derînin,û cîheke xweş ji wanre dabîn bikin ku têde hest bi zarokitya xwe bikin. Wek tê gotin( zarok nifşen ayindene)lê eger bi vî şêweyî zaroktiya xwe bibhurînin,gelo wê çi karibin ji ayindere bikin???

Eger tu zadê xwe av neke wê çawa sinbilan bide????!!

**Mihemed Alûcî ...Amûdê**





## Bajarê dêrikê û pêkvejiyana hemî kesan



Weku tê naskirin li bajarê dêrikê gelek pêkhatiyên civakî têde dijîn ji kurd, ereb û xiristyanan, lê pi-raniya xelkê bajêr kurd in. piştiî demek dirêj ji şoreşa gelê sûrî, rêtîma xwîn mij dixwest bi hemî awayî ku şerekî navxweyî li dar bixe dinavbera hemû pêkhateyan de li sûrî. lê tevlî vê yekê jî gelê sûrî rê neda pilanên vê rêtîmê li ser serê wan cî bigrin an bikevin bin bandora



wan de . û gelê sûrî hişyarbû ji vê yekê re û li berxweda, û wê li berxwe bide li dijî hemî nexweşîyan û astengîyan. ev miletênu ku li dêrikê pêkvejiyan dikin ev çendê salan weke bira bihevre dijîn.

- ji bo van babeta em li dêrikê li gel gelek kesan rast hatin û me jiwan di pisî li ser vê rewşê weha diaxvîn. em ji berê ve bi hev re dijîn li vî bajarî tucarî ew nakokiyêñ mezin me nedîtine di navbera xwe de, her û her em xêrxwaz in ji hev re û em dibêjin emê wek xelkê bajarê dêrikê aştîxwaz bin, û azadîxwaz bin, û bê guman em ê li ser vê yekê bin ta em sax bin û her bijî biratiya gelan.

Bajarê dêrikê  
**Mehmûd Şahîn**

## Cejna Qamişloyê ne wek cejnan bû...



Her weku tê zanîn ku hatina cejnê helkeftineke ji bo keyf û şahiyê ye, ji bo têkiliyên civakî di navbera milet de bi-hêzîr bike û derfeteke ji bo gel ku bêhîr nêzîkî hev bibe..

Ew şahiya ku zarok bîhêviya wê bûn, îsal negiha Qamişloyê, ji ber ku rewşa welêt bi tevahî ne ew rewşa ku bikarîbe pêşwaziya keyfê bike.

Şer, kuştîn, pêwariya av û kehrebê û buhabûna cil û şekrên Eydê, hemû eger in ji vê rewşa taybet re ya ku hişt milet îsal bi cejnê şâ nebe..

Me hevdîtin bi hin hemwelatiyan re kir, û peyv û nerînê wan ji rewşê re ev bûn:

Nîdal ew firoşkerê mirîşkan e wisa axift:

Îsal cejn tune ye, û bila tu kes nebibeje ku cejn heye, ji ber ku di roja yekem de va em daketine kar, û haya me ji wê tune ye, ta me gelek mirîşk jî



nefirotibûn mîna salêن berê di dema cejnan de. ji wê rastiyek e dema em dibêjin ku cejn tune ye. Mehmûd ew jî firoşkerê goşt e : Birastî di vê cejnê de firotina goşt li gorî salên berê gelekî kêm bû, û em dizanin ku ew ê rewş dê wisa be, ji ber ku tu kes nikare şahiya cejnê bike û ev şer li drdora me heye, ji bilî wê jî her tişt buha ye. Li bazara navendî ya Qamişloyê ew çalakiyêñ ku carne ji bo cejnê dibûn îsal pir kêm bûn. Me şekirfiroşeke dît û me ji wî pirsî rewşa bazarê bi tevahî çiye:

Na, îsal mirov dizane ku gelek ji milet cejnê nake, ji ber ku me kêm xelik di bazarê de didît, û ew jî sedemên wê hene, rewşa ku em tê de derbas dibin rewşeke xirab e, çawa em ê cejnê bikin û şre li hawîrdora me dibe.. kuştîn û rijandina xwînê li dar in.. dem ne dema cejnê ye, cejna me wê bi Azadiyê re be.

Ne zarok û ne leystik û ne jî kenêñ wan kolanan diximilîne, îsal şahî ji wan hate revandin, tenê di bîraweriya wan de weke birînekê wê bimîne, tenê roja şahiya mezin ew ê dê bikaribe vê birînê derman bike.

**Welat - Elî Namalî**



## Penaberên Kurdên Sûriyê di penagehên herêma Kurdistanê de...di nava xewin û çerpezebûnê de..



Di navbera alava kujer a rêtîmê û şûrên di destê komên tundrew de miletên Sûriyê bitevahiya xwe û Kurd bitaybetî ji vê rewşa aloz pir neçar bûne, û êş û azarî gelekî dîtine ,ji bilî birçîbûn û sîtemê. Û ta bi Welat ji wan re jî bûye şûrê ku xewnêwan dibire.

Ji wê, gelek ji milet rahîjtine xwe û zarokên xwe û dest bi şopandina rîyên penaberiyê kirin, û bîranînê hebûna xwe li pey xwe hiştibûn, ber bi neyazên xwesiyê ve.

Û wisa jî Kurd di penagehên herêma Kurdistan de.

Di vê dema dawîn de bêhtirî (30 000) penaber ji Kurdên Rojavayê Kurdistanê li wan penagehan bi cih bûne. û ew jî hatine belavkirin li ser :penageha Biherka (15 k.m.)bakurê Hewlêrê, û penageha Korkosk li ser rîya Suleymaniyyê-Hewlêr.

Û di serdana me de ji yek ji van penagehan re ,birêz Şêrko Mele Derwêş ,yek ji berpirsiyarên penagehê ye, me agahdar kir li ser rewşa van penaberan:

Kesên di vê penagehê de bi cih bûne bêhtirî (10 000) mirovî ne ,û ew jî ji Kurdên herêmên Kurdî ne, û Kurdên

li herêmên din ên Sûriyê dijîn(Şam,Heleb,Reqa....hwd..).û ev penaber hatine belavkirin li (250)konî.û (3)hingarên mezin.û em amade ne ku em pêşwaziya gelekê din bikin.û hevkariyek di navbera me û hikûmeta herêmê de heye ji bo vî karî.

Û ji hêla tenduristî ve Dr.Ednan Şamî(bijîşkên bê sînor) ragihand ku ev penaber pir westiya ne ji dijwariya rê û bendewariya ku dirêj kiribû li ser sînor berî ku ew vebê.û gelek nexweşî jî di nav wan de hene(nexweşîya şekir,ên dil....)û nexweşxaneyeke biçük li penagehê heye.lê nexweşen ku nexweşîya wan dijwartir be ,ew diçin nexweşxaniyên mezin li Hewlêrê (Rêzgarî û Cemhûrî),

Tevî ku derman û şîrên zarokan jî têtîn peydakirin ji penaberan re.

Delal Mihemed Seîd ew jî xwendekar- eke Kurd e ji Qamişloyê ye,ku Bekel- oriya xilas kiribû ,lê nedikarîbû beşdarî zanîngehê bibe ,ji ber şerê ku li tevahiya Sûriyê dibe.neçar bibû ku ew û malbata xwe koçber bibin li vir.

Delal dibêje: em pir westiyabûn ji zeh

metiyên rê û dema dirêj a ku em bendewar bûn ta dergehê sînor ji me re vebû.û ew jî bû sedem ji nexweşîya bayç min re .û ez beşdarî Komela Nerîn bûme ,yek ji komeleyên ku alîkariyê didin penaberan digel gelek komeleyên din wek Bijîşkên bê sînorû Xêrxwazên Berzanî. Ebd el rehman Yûsiv (56)sal ji şêneyen Kurdistan ên Şamê û ji ber şerê giran ê ku li Şamê qewimîbû dest ji karê xwe berda bû û vege riya bû Bajarê Dêrikê .lê ji ber rewşa aloz û xirab a bajêr berê xwe dabû herêma Kurdistanê.û tiştê ku ew î xemgîn dike ew e dûrbûna wî ji hredü zarokên wî yên xort.yek ji wan ji artêşa rêtîmê veqetiya bibû û berê xwe da bû Turkiyê,û yê din hêj leşker e,û ta anîha jî nedikare revêkê ji xwe re bibîne .

Hêjaye gotinê ku hikûmeta Herêmê (20 miliyon dollar)ji penaberan re amade kiriye.tevî wê jî Nûnertiya Netewênen Yek-girtî dibêje ku ew pere ne bes in ku têra van penaberan bikin.

Ji wê, ji hemû komele,komît û rêxistinê lihewarçûyînê tête xwestin ku bi erkên xwe rabin li barê van penaberan û bikaribin pêdiyîn sereke ji wan re bi cih bi-hênin.

**Mistefa Mistefa**





## Hebûna kurdan û lehiya Nûh

Her miletikî ko ji riya xwedan derdiket xwedan pêximberek ji wan re dişand, Nûh ji yek ji ewan pêximberan bû ko 950 salî li ber miletê xwe geriya bû lê tu bawerî bi yekxwedaniyê nekirin jibilî kesine pir hindik. Jilewra xwedan lehiyeke bê hedan bi ser wan de şand. Ebdulwehab Elnecar di pirtûka xwe yî bi navê (Çirokên Pêximberan) de dibêje: "gelo lehiya Nûh li hawîrê dunyayê bû, yan jî li deverike bi tenê bû?!" Piraniya zanistêni biyolocî û ciyolocî dibêjin ko ev lehî lehiyeke gelempir bû, li hawîrê dunyayê bû, ji ber ko lêkolînêni wan yî di analaysiza gelek kevir û pêmayêni caneweran de di serê piraniya çiyayêni dunyayê de dide xuyanîkirin ko ew pêmayêni canewerine ko ne di nav avê de bin nikarin bijîn. Lê ji alîkî din ve hindek dîrokvan dibêjin ko ev lehî taybet e, ne gelempir e, û li hawîrê çiyayê Cûdî pêkhatiye, û deverêni din ji dunyayê tu lehî li wan çênebû ye, ji ber ko şarezayıya xelkên Hindê berî lehiya nûh bû, herwekî berdewam bû piştî lehiyê ji. Ev herdû nerînêni cuda li ser gelempirî û taybetmendiya lehiyê ne pirsirêkeke mezin e, lê bê guman gemiya Nûh hatiye çêkirin û li ser Cûdî rawestiya ye, û lehî ji çêbû ye û tu kes jibilî bawermendan nema ne wek ko Qurana pîroz dibêje: "وَعَلَنَا ذِرْتَهُمُ الْبَاقِينَ". Lê pirsa ko tête bala merov "gelo piştî ko qadê ava asîmanan vexwar, û xwarin û vexwarina kesen di gemiyê de bûn nema li ko dakin û li ko akincî bûn?! Wisa jî di Qurana pîroz de hatiye: "وَقَبِيلٌ يَا أَرْضَ الْبَلْعَى مِنَ الْمَاءِ وَغَيْضِ الْأَمْرِ وَاسْتَوْتَ عَلَى الْجَوَدِيِّ مَاءُكَ وَبَا سَمَاءَ أَفْلَعَى وَغَيْضَ الْأَمْرِ وَاسْتَوْتَ عَلَى الْجَوَدِيِّ". Nûh jî ji xwedanê xwe re wiha digot: "وَقَبِيلٌ رَبُّ أَنْزَلَنِي مِنْ زَرْبَ مَبَارِكًا وَأَنْتَ خَيْرُ الْمَنْزَلِينَ". Piştî ko dakin ji Cûdî li deşta Cûdî rûniştin, li gundekî hate naskirin piştî lêrûniştina wan bi navê (Heyştiya). Ev nav jî dîrokvanêni kurdan dibêjin ji gotina (heyşta) hatiye dariştin ji ber ko heyşt kes di gemiyê de bûn. Wisa Qutada ji digot: "Nûh û pîreka xwe û hersî lawêni xwe û jinêni wan dibin heyşt kes". Lê Ibin Ebas dibêje: "Nûh û hersê zarokêni xwe û jinêni wan û 73 kes ji zarwêni Şêsi bûn, anku tevde dibin 80 kes". Lê herdû gotin heyşt û heyşte di kurdi de nêzî hevin helbet nêzîkî (Heyştiya) ne jî. Piştî ko zarokêni Nûh li Heyştiya akincî bûn û hejmara wan roj bi roj zêdetir dibû berê xwe dane deşte, û hêdî hêdî lê bela bûn û gelek bajarak avakirin mîna: (Dornex, Azex, Keznex, û Şernex). Zimanzanêni kurdan wiha dibêjin: "ev gotinêni bûrî bi (ex)ê kuta dibin, ew jî ji ber ko lawêni Nûh navêni bajarokêni xwe



li navê bavê xwe dikirin, wek nimûne: gotina (Şernex) ji (Şarê Nûx) hatiye, weke ko gotina (nîro) ji (nîvî rojê) hatiye, û gotina (Amêdiyê) ji (Avahiya mîdyâ) hatiye. Herwekî Nûh pêximberê nuh e, piştî Adem e, anku Nûh kurde?! Ji ber ko wateya navê wî bi kurdî wisa ye!. Lê em xweş dizanin ko hebûna neteweyan ji zarokêni Nûh dest-pêkirî ye, wek ko pêximberê musilmanan Muhammed dibêje: "zarwê Nûh sisê ne, Sam, Ham, û Yafis. Sam bavê ereba ye, Ham bavê zinciya ye, û Yafis bavê rûma ye". ( Rûm jî tê wateya kurd, furs û ewropî ) jilewra em nikarin bibêjin Nûh kurd e, tenê ji ber ko gemiya wî li deverike kurdî danî ye, û ew dever bû ye deverike kurdî piştî ko zarwêni Yafis lê akincî bûne. Temenê gemiyê jî sed hezar sal e, û pêmayêni ewî zarokî di şikefta Şaneder de ko hatibû dîtin nêzî çiyayê Cûdî digihêje 70.000 salî, ew jî çaxê dema kevirî ye, ko zarwêni Yafis li hawîrê Cûdî bi cih bûne. Ev tev de koçberiya yekem bû ji zarwêni Yafis re, paşê reha arî belav bû û dest bi koçberiya didwan kir û gihane ewropayê û her derê cîhanê. Bi vî hawî netewa kurdan hatiye naskirin, û em xwe naxin qayîş û berberiya kî kevnare û kî jî nûhatî ye, tenê besî me ye ko 70.000 salê me li cîhanê hebe.

### Sîpan Ehmo

**E**z dikarim bi zimanekî xurt bêjim ku, pir helbestvan hene helbesta nûjen li hirêma me Kurdan (îl Sûri) dînvîsin, lê kêmîn yê helbesteke nûjen dînvîsin û bala mère dikşîne bi afirandina xwe, yek ji wan navdaran CegerBirîn bi xwe ye.. Lê mere dikare navê sê-çar kesên din jî bêje, mîna Dildarê Aştî û Rizoyê Xerzî, Tengezar, Nezîr Palo hwd, ji nifşen salên notiyan û vir de.

Neyse, ne ev babeta me ye, me naverok divê, ku helbesta nûjen bi mijara xwe, bi wate, wêne, lihevhatin û berhevokên xwe nûjen be û ji kevalên jiyanê bin, hest û giyan têr bike.

Pirtûka helbestvan bi navê: (Sîmfonîyek Evînî Liber Çirayêñ Gundê Me -1998), bi rasî ev nav-nîşan dirêje nizanîm çîma? Ji ber merov vê nîşanê datîne ji bo li ser ziman sivik be, navê dirêj nay gotin, mère kurt dike ji xwe re û dibêje weke mînak: (Sîmfoniya Çirayêñ Gund) an (Sîmfoniya Evînî). pirtûk bi xwe ji 63 rûpelan pêk tê, û ji 44 perçe helbest, helbestin kin û tije wêne û bîber, û her helbestek şêwê çîrokî jî tê heye. wê dixemilîne bi rêzkêşiyêñ hevokan. tevî ku helbesta serbest û helbesta pexşane ew jêre navê.


Belê weke bûye her carê ku nivîskar pirtûka xwe diyarî dike, wiha jî CegerBirîn pirtûka xwe diyarî dike: Bo evîndarê azadiyê, dengbêjê merovatiyê yê Kurd û cîhanê (Şivan PERWER). û ti têbniyê de dibêje, weke vexwedina Osman Sebrî: (ronahiya di çavêن xortêñ Kurd de, hêviyek mezin dide ku xwendin û nivîsandina zimanê xwe baş hîn bibe, ya me ji wendabûnê biparêze, hînbûna zarê şêrîn) rpl3. bi kurft min anî.

Tiştê balkêş ew e ku CegerBirîn pir razên Zerdeşîyan tîne naveroka helbestên xwe, ji misloca pîroz: Zende Avîsta, mînak: Îreman, Ahromisda, Kobîdon, Ariyan Wîc, Birat Farkîş, Arde Wêraf, Ferafaşî, Hadoxit Nask û Pira Cinêfat..hwd. tevî navê Sîmfoniye navê xwedî tîne ziman dibêje: (Bîranînê rojan -mîna sîmfoniya Bîthovin- çavan dixe girî) rpl4.

Wêneyêñ helbestan bi mînak û maftî têrin, mîna :

- Li şûna xwe hişt/ewrekî tije girî rpl 6.
- Ji wê demê şev kete raza/ û şopa lingê Kobîdon bûn stêr. rpl 24
- Çîma çav û bêdengiya te/ bi tîrs û pirse/ di vê bîstikê de ji te hezdikim/ û didim te dev û lêv. rpl 37.
- Ne tîrsonekim/ ne dil kevirim/ tu dizane ger ne ez bim/ tukes li ber pirsên di çavêñ tede xwe nagire. rpl 44

Di dawî de emê vê perçe helbest diyarî we bikin:



### Raman

Berî salan  
Berî babilîşkan..  
Raman xwedanek bû  
Ta bû merovek  
Ta û ta bû bi hevketinek  
û bi hevketinê bû du bend  
Du bendêñ bi pêwend  
(Ahremiza) û (Ahrîman..!). rpl 17.

## Abeya kurdî

Abeya kurdî (latînî) ji sî û yek tîpan pêk tê. Her tîpek bi du şêweyan tê nivîsandin. Gir û hûr

- Şêweya gir :

A- B- C- Ç- D- E- Ê- F- G- H- I- Î- J- K- L- M- N- O- P- Q- R- S- Ş- T- U- Û- V- W- X- Y- Z.

- Şêweya hûr:

a- b- c- ç- d- e- ê- f- g- h- i- î- j- k- l- m- n- o- p- q- r- s- ş- t- u- û- v- w- x- y- z.

- Di abeya kurdî de heyşt tîpêñ bi deng hene, ew jî ev in: A- E- Ê- O- I- Î- U- Û

Jê pênc dengdirêj in : A- Ê- Î- O- Û, û sisê jî deng kurt in: E- I- U, û bîst û sê tîp bê deng in.



## PEYV Ú PÊNÛS

Peyva min bê hiş maye  
 Peyva min li ser rê rawestiya ye  
 Matmayî maye  
 Naxwaze ji min dûr bikeve  
 Ez çawa bêjim  
 çiyayêñ min mijûl in bi birîna xwe ve  
 Ez çawa bêjim  
 çemên min dilopên hêsrên xwe  
 Berdewam dîkin  
 Û zaroka birçî ..zaroka min  
 "di" Beyaniya dilşikestî de divê  
 Banga wê dîghê "tevahiya" cîhanê  
 Û dayka wê ya birîndar  
 Di canê xwe de... Ez im  
 Wê dilorîne bi dilovaniya destê xwe  
 Wê dilorîne bi dengbêjiyeke Kurdî ... jarê  
 Dipeyive li ser bavekî  
 "ku"Di şeveke reş de "çû"  
 Û nema hat  
 Peyva min bê hiş maye

### HELBEST YÜSIV



Dilsa

## Şayan

Serwera kenfiros û meygeran  
 Landika gulfiros û periyan  
 Şayan....  
 Jiyan..  
 Ji serma mirinê xwe bi canê wê dipêçe  
 Mirin ji tirsa leşgerên wê yên jînê bêhiş dikevin  
 Èş..  
 Di hebûna wê de ji warê min koçber dibe  
 Şayan ey hevalê...  
 Lîv..  
 Ken ji keleha kîfxweşyê baris dîkin  
 Şayan...  
 Demê xwe windakirye digel rûkê te yê mîna sibheke buharî  
 Roj...  
 DiQulibe ...  
 Rûpela şevê dişewitîne  
 Ta ku serxweş  
 Bibe bi meya çavan  
 Şev ..  
 Heyvê hembêz dike  
 Lava dike ku roj li merîx bilukume  
 Ta ku ew xemgîn nebe bi dûriya te mîra zerîyan  
 Erd û ezman pevdîçinin  
 Ezman dibê ez warê kevokê me  
 Erd dibê ez hêlinâ lîlozê me  
 Û derya bêhin çikandî bilez tê  
 Dibêje ez dayika sîpêlê me  
 Lê ez ser bilind dibêjim  
 Ezim hevalê delalê  
 Heval

### Baz Elî Bgarî





## Xwendina dígital Di navbera Ciwaniya eknîkî û hermeneutîka de

Taybetmeniyê her dem û devekerê hene. Di hundurê van taybetmendian de jî, pirsên cuda û ciwaz diafirin, wate her demek, pirsên xwe bi xwe re diafirîne.

Eger bi van hizran em berê xwe bidin pirsên heyî, dê bikaribin xwe di hundurê mêjöyê de biliñin û dê bikaribin, roleke kartêker bilizin, ji dêvla ku li perawêza jiyanê bimînî.

Bêgoman, dema gullobalizimê, bi têkîlî û teknika xwe ve, dequekî cuda ji jiyanê afirand. Em jî wek xwêner/bîner/kartêker/ berhem(dar/bar), mecbûr in di vê çarçewê de, pirsên xwe bi rengekî din, cuda ji yên berê damezirînin û xwendineke nû li jiyanê/deq bikin.

Di serdemêr sermiyandarî û di pey wê re, ta dema gullobalizim/ Massmedia yê de, felesefî dikarîbû pirsên xwe di derbarê jiyanê de, bi çareçew bike. Lî di dema teknolijîya hûr û bilind de/ Data, pêşberî asteng û aloziyên zor, di warê hermeneutîka deq de (têgehîstîn û şirovekirin) dibe.

Ev neşîyaniya biçareçewkirina jiyanê ji hêla felesefî ve, xwêner ber bi qûnaxek nû ve bir û ta radeyeke bi hêz, pirsên xwe li ser wî ferz kirin û dikin. Ëdî li hember vê rewşa nû, xwêner pêdivî bi xwendineke nûtir, li ser gelek asteyan heye.

Ji ber ku babeta me jî xwendina dígital û ciwaniya wê ye, dê berê xwe bidin wan amurê nû û têkiliyên amurê digital di gel xwêner û katêkirina wan herdîwan li hev. Eger dema berê xwendin û xwêner di bin asîmanê çapemeniya kaxez û ximavê de, hest bi ciwaniyê dikirin, lê niha monîterê komputer û tora internêtê, wî vexwendî pirsên cuda û bi lez dike, rê li ber gillî û gazîndan navekê û rô nade xwêner wek xwe li ciwaniya nû binere. Li vir, tu xwêner û bi teknolojiya ve digihî, an jî nexwêner û. Eger em nebêjin tu ne anAlfeBtî ?.

Toreya çalakî û kartêker/Hyperfiktion, cihekî xwe, me bivênevê, di qada deq û ciwaniyê de girtiye. Şêweyekî nû, li cihekî nû bo çav û hizirêñ xwêner. Lewra xwêner pêdivî bi têkiliyeye nû heye, bo astê ciwanî û çêja xwendina xwe ji deq re bilindir û nûtir bike.

Li vir xwêner pêngav bi pêngav ji layê amur/nivîskîr ve tête vexwendî/mecbûrkirin, ku xwe têkildarî prosesa dahênanê/ berhendariyê bibe.( kêm-zêde, mecbûr dibe besdarî prosesa ciwaniyê bibe û refatake çalakane bilîze).

Dibe ku ji nêrîna yekem ve, em seyr nemînin û bibêjin, belê ev şewebeşdarî, xala sereke bû, di berhemanînen Bertold Brecht, di şanoyê de. Beşdariya cemawer/xwêner bi lîstikvanan/nivîskar/messaj, re, 1 bi 1, çêj û ciwaniya peyamhînêr û peyamgir nêzîkî hev dike û terazûya ciwaniyê, di hundurê wê têkiliyê de bilind dike û hinga em dişen bibêjin prosesê biyava xwe yê sêqolî wergirt.

" Ev pirs di hizra xwêner de digere, lewma pişikdariya xwêner, hêzekê dide deq, dibe sedema ku buyer bi xwe lîstika xwendinê bike"

Xwêner di gera xwendinê de, bişkuj, xêz û xezokên mejî dixe bizavekê. Di wê bizavê de, mejî velerizîneke taybet dike. Di wî hişî de, nûcê wek wêne têne veguhestin û têni guherin. Epystomolojiya xwêner xwe li digihîne hev û dest bi prosesa berhevhevkirina zaniyariyêñ kevin, serpêhatîyêñ kevin û zaniyariyêñ deqê li ber dike. Di vê lerz û bizavê de, xwêner pêrgî çêjeke nû û ciwaniyek nû dibe. Di Hyperfiktion de, Xwêner, rola xwe dahênanê pêktîne. Bi tikina linkekî prosesa pêgehandinê pêk têt.

Ev bi serê xwe, rola pêgehandinê ji xala netîtekî berbi zeryayeke ji nişan û nûcê û zaniyariyan ve dibe. Çimkî ew tikandina wan şîfreyan, dibe kilit ji bo derbasbûna nav deqî û peydakirina asteyeye nû ji hermeneutîka, bo deq û şikandina wê bendewariya çêj û spehîtyen kevin.



Eger, em bi hûrbînî lî vê prosesê binêrin, dê bibînî ku hiş di Hyperfiktion de, ji derve tête û ne mîna xwendina pirtükî ye.

" liberçavanîna di hiş de, regezekî derveyî ye. Şûnwarekî xwe yê spehîtyê taybet ava dike. Di vî şûnwarî de, xwêner xwe li gor Hyperfiktion bi sîhor dike, dan û stendinê dike, birayra xwe bi xwe dide û bi xwe jî werdigire. Radeyeke pirr ji essehiyê li ba xwênerî dest pê dike û dibe êtûna nivîsadin/xwendina hundurî(Zihînî)ê"

Bi vî şêweyê xwendinê, xwêner dibe desthilatarârî li ser deq. Eger em romanê wek nimûne deynin ber çav, dê bibînî ku xwendin û râvekirin alîgîr û cimikîn hev in.

Ev şêweyê xwendin, weha dike ku bi nêrîneke din li deq bête temasikirin. Bi vê xwendinê erkîn xwêner bêhtir dibin.

Bo nimûne, pêdivîye xwêner, deq bi reng, ronî, dîkor alavêr pîrekêş in.

Boşahî, xiyal û cih, dikarin xwêner têxîn deryayeke ji pêlîn reng û dengan.

Listina tilîyan û awirêñ çavan di bedewiyeke lerzane de melevaniyê dike. Xwendina linkeki "Hyperfiktion", xeyal li hember realîte ye.

Ev pergale dibe çalakiyek di hundurê amûrê komputer de û ew wêneyêñ li ser monitor di boşahiyeke ji reng dengan de dilîvin.

"Xala herî balkêş di hyperfiktion de ew e, ku asoyêñ berferh û konkrêt di hizra xwêner/bîner de tête afirandin û zemînekî ciwaniyê taybet pêktîne"

Şiyana teknîkî cihekî berçav ji hêla huner, zanîn, sazî û ciwaniyê ve digire, rêka serwextbûna me destnîşan dike.

Ev cihê hunerî ku li berçav wek realîte, biyav û zeviyêñ ségoşeyî dadimezirîne, xwêner/bîner ji ji dibe qeptanê deq, bûsela wî jî hermeneutîka wî ji deq re ye.

Li vir pêdivî prosesê bi ciwanî û zaniyariyêñ bi şêweyekî cuda ne.

Li vir prosesa jihevixistin û levxistina symbol û şîfreyn deqî dest pêdike.

Çendî jihevixistena şîfre û simbolan bi wirdekarî liservxe be, wisa jî levxistina wan bi hermeneutîkeke ciwan û keşke tête ristin.

Ji ber wilo jî xwênerê hyperfiktion pêdiviy karê xwe bi zîvrî bike.

Xwêner/bîner, di cîhanekî din de xwe dibîne, ku têkiliyêñ nû, li ser bigeh û asteyêñ nû û cuda peyda dibe.

Civak jî, bivênevê derbasî qûnaxeke nû dibe, pêrgî şêweyekî nû ji xwendinê dibe, pêrgî dilogkirina jiyanê dibe, dikeve dava deqî.

Wate, deq û xwêner di gelek caran de dibin yet, lê di hin caran de, xwêner dibe temâşevan.

Lê di rekeha teknîkî de, mirov nikare nepişikdarî bimîne, çimkî, reng, ronî, dîkor alavêr pîrekêş in.

Xwêner/bîner li ber dergehîn nû radiwestenîn û ew jî nikare xwe bi virde û wir de bibe. Ew mecbûr dibe têkîlî prosesa hevpejirandin, hevgehîstîn bibe.


Encax bi vî şêweyî, xwêner bikaribe di jiyanâ digital de, qûnaxêñ tarî derbas bike û bi ciwaniyeye nû regezêñ nedîyar ji taristana amûran derbixe û bêne jiyanê.

## Tengîzarê marînî





## Însulîn



(ji latînî insula anglo island bi Kurdî girav) hormoneke protînî ye, ku ji 51 tîrşiyên amînî yên hevbend (composed) pêk tê. Erkê xwe sîstemkirina şekir, nişa, don û karbohidratan di nav riya xwînê de di laşê mirov û çalakiyên cîgerê de diguhere, ku glokozê embar dike (store). Însulîn ji giravên Langir Hanz di pankiryasê de tê derkirin. Nexweşen bi şekirmîzî û şekirî(diabetes mellitus) gelek însulîn ji wan re her roj divê, ji ber ku însulîn di xwîna wan de hindik e yan tune ye. Lî çawa însulîn didin wan? Bi riya derziyên însulîn di bin çerm de, lê bi riya dêv nabe were dayîn, ji ber ku avêr ûr ji hev dixe. Pir Südê pîvazê ji bo kembûna însulîn li ba nexweşen şekirmîzî heye.

Jêder: Wikipedia



## valahiyâ dagire bi jimaran ( serrast û serjêr ) ji bo encameke rast

τ	+		-	τ	+		+	ξ	=	
+		-		+		+		+		+
	-	τ	-		+	τ	+		=	ο
-		+		-		-		-		-
λ	+		-	τ	-		+	ξ	=	
+		+		+		-		+		-
	-	τ	-		+	τ	+		=	τ
-		-		-		+		-		+
ξ	+		-	λ	+		+	τ	=	
=		=	=	=		=	=	=		=
	+	τ	+		+	τ	-		=	τ

amadekar : Solîn Sîno



# تأثير الموسيقا على المجتمع الكردي



إذا أردت أن تعرف مدى تحضر مجتمع ما ..... فانظر إلى موسوعة  
كونفروشيوس

الانسان بالفطرة يتفاعل مع النغم فهو يتشرب الموسيقى منذ تكوينه الجنيني الاول في رحم امه.....ولطالما كانت ولا زالت الموسيقى أقوى سلاح معنوي لانها تلهمنا في كافة الظروف ..فكما لاي امة لغتها المميزة وثقافتها وتقاليدها الخاصة يكون لها كذلك موسيقاها واغانيها التي تبرز شخصيتها وتعبرنا بها...  
جدير بالذكر هنا موسيقانا الكردية ...طابعها الجبلي اغنها بالشاعر الحماسية في كل الميدان حزنا كانت أو فرحا....تهويدة أم او حتى ثورة ...  
وقد ترافقت تلك الموسيقا مع الكلمة كعلاج بحضور النزعات الطبيعية فيما حتى نعمل وندعوا بشكل افضل فكانت أصدق مترجم وأفصح معبر عن المشاعر والاحاسيس التي تم بها الشعوب الثائرة وهذا ليس بغريب في موسيقانا الكردية فهي تلك تاریخا حافلا في هذا المضمار من خلال ما كان يصلانا عن توجيهها لانتصاراتها بأسمى الان瀚 واجمل الاغاني الثورية ...فكانت تکلل الابطال والجنود وتقدر تضحياتهم وتحفظها ....  
إلى ان جاءت الثورة لتوظف الحس القومي بعد ماتخافت نوره في الاونة الاخيرة فأثارت الطريق امام الناس واتت بالحان فلكلورية مع كلمات بسيطة عكست مرارة الواقع...ونظمتها في أغان ..ترفع من المعنویات وتحمل في نغماتها الطاقة والقوة ...  
ثم ان نهوض شعبنا ظهر أثره في جميع نواحي الحياة حاملة في ثناياها شعار القوة والتضحية ..في سبيل العزة والكرامة وهذه النهضة لابد من الموسيقى المعبرة عنها ..والمسايرة لها... فما الموسيقى الا توقع بهز المشاعر ويحفر على النضال ..مع كل كلمة ..مع كل نغمة حكاية هذا الامة الثائرة .....خطواته نحو المستقبل ..وتطلعه الى الحرية .

هولير تحتفي بالكرد السوريين

العينية والمادية للنازحين الكرد السوريين الذين دخلوا  
مقاجي، وقد خصصت الساحة القرية من متزه  
وبهذه المناسبة وجه رئيس الأقاليم السيد  
وفعالياتها دعاهم فيه للقيام بواجب القومي  
والنهوض بواجب الضيافة على أكمل وجه..  
هولير متمثلة بمحافظها السيد "نوزاد  
تسهيـل وصول العربات وتنظيمها إلى  
عملها.  
استقبال هذه التبرعات وتحمليها في

الفضائية التي خصصت بثها اليوم بأكمله عشرات الآلاف من أهالي وسكنى كان أولى نكبة النزوح المليوني عام 1991 ، وكانت بالغا لهم، وبعثوات حلبي الأطفال لصالح الحملة. قاطني مخيم (داراشاكرن) الذي يقع في قضاء خبات والاحتفاء به، واستمع لهم، ووعدهم بالعزيز من العمل

فراش محمد

ويذكر إن الحملة لا تزال مستمرة حتى اشعار آخر، حيث يتوقع توافد المزيد من المتبرعين لصالح الحملة.

شهدت أربيل يوم الاثنين 19-8-2013 حملة لجمع التبرعات مؤخراً إلى أراضي الإقليم بدفعات كبيرة وعلى نحو (بارك) شأنه ده ل تكون نقطة جمع هذه التبرعات مسعود برزاني نداء إلى مواطني كردستان والانسانى تجاه أخوتهم في غرب كردستان وقادت هذه الحملة برعايا وتوجيه من محافظة هادي . وقد ساهمت شرطة مرور هولير في مكان الحملة، ومساعدة اللجنة المنظمة في كما نشطت اطقم الهلال الأحمر الكردي، في قوافل لتساق إلى المخييم وتوزع على النازحين . واستأثرت بالحملة الإعلامية قناة زاغروس لمتابعة مجريات الحملة التي شهدت تدفق وضواحيها، الذين لبوا دعوة الأخوة، مستذكرين أجمل اللحظات وأصدقها صور الأطفال وهم يتبرعون وفي غمرة الحدث، فاجن السيد الرئيس مسعود البرزاني بزيارة لتقدف أوضاعهم، حيث هرعت جماهير غفيرة لاستقباله لتحسين أوضاعهم.



# Kulîkîn Kurdistanê

Ji bo wan perwane û kulîkîn Kurd ên ku derfet ji wan re peyda nebû di baxçê zimanê dayîka xwe de bilîzin û perwerde bibin û ta roja îro matmayî dimînin û kîfxweşîjî dibin dema ku filmekî an şanoyekê an lîstikekê bi zimanê kurdî li ser ekranê tilfizyonan dibînin.


Ji bo wan zarokên ku baca kurdbûna xwe û xwendiyênen xwe didin û ji fîrbûna zimanê xwe, zimanê kurdî bêparin. ez vê helbestê diyarî wan dikim. Û ji ber ew nikarin bi çavên xwe yên reş û belek û lîvîn xwe yên ter girêkîn porê helbestênen xwe vekin, ez hêvîdarim dayîk û bav û xwîşk û bî-rayênen wan ên bi kurdî dizanîn ji wan re evê helbestê bixwînin û naveroka wê şîrovekin:

Keskesor

Bûkeke sipehiye	Pir jîr e yên bizane
Tîrêje ronahiye	Navê delalê ci ye?
Keça rengê sipyie	Kevanekî heft reng e
Kî dizanê ew ci ye?	Aleke şox û şeng e
Wek parek a bazin e	Dibrûse pir çeleng e
Li jore pir mezin e	Ma we naskir ew ci ye?
Ne zêre ne hesin e	Ew ne reşe ne mor e

Li banê bê sînor e
Rengê yekem jê sor e
Navê xwe .....

Salih Demîcer  
U.S.A



## Beleko û kerê Cûn

Beleko hîna bi segurkê re Kerê xwe kurtan kir, werîs lê aland, û berê xwe da ciyê. Dibêjin barê xwe yên êzingan kir, li ser pişta kerê girêda, ber bi Kerê hat ku Cûno biner e, dem zivistana heriye û şiliye, û emê nuha herin bajêr, ji bo em barê xwe bifiroşin, biner e va ez ji te re dibêjim, Xwedê te ji rê nebê û tu li nava bajêr xwe li bin guhê tu Efendiyan nexînê, û cil û bergên wana pîs nekê, biner wê li min xînin, û min barê wana nîne, hayî ji xwe hebe daku em bê qeda û bela vegerin mala xwe. Dibêjin li tengeceldeyekê ji yên bajêr serê Cûno, Beleko û çar efendiyan li hev rast bû, ku wa qamçiyen wana di ber cizmeyan de ne, û bi fors tene tene dimeşin. Kerê gewr ji hema rast û rast xwe li bin pêxê wana xist û piçikên heriyê bi ser serê wana xistin, hema wana ji qamçiyen xwe ji ber cizman deranîn, û bi belengazê Beleko ketin ji wî eyarî xistin eyarekî din, ser û çav lê werimandin. Beleko ji ji kîn û kerban, çav di serî

de bûne mîna du perengan barê xwe firot, û li ser pişta kerê xwe siwar bû, û ha..ha.. lingan lê dihejîne, bi bayê bezê dixwaze wî ji bajêr derxîne, ji bajêr derketin, gihane newalekê li wir hate xwar, kurtan û hefsar ji ser de anî, Xencera xwe deranî ku Cûno ma qey tê îro ji lepênen min derkevê, Kerê kurê wî Kerî ma min ji te re negot haya te ji te hebe, û tu xwe li bin guhê tu kesî nexînê, an ji tu rik û kînê bi min re dikê ma qeyî min bavê te kuştîye yan ji Kehrik û Berxikêd min ketibûn rezê bavê te? Bi xencerê Kete ser gewdê wîna ew kire parce parce di ciyê cî de ew kuşt. Kurtan û hefsar avêtne ser milê xwe, û hêdî hêdî berê xwe da malê, nêzîkî li bênderên pişta gund kir birayê wî yên mezin bala xwe dayê ku wa Beleko kurtan li ser milê xwe kiriye, û bê Ker ber bi mal ve tê, xwe berda pêşîya wî ku wa Beleko kuro ka Kerê cûn, cîma ser û çavênen te werimîne? Ku... hahew bira hahew hema jê ve be, bi Xwdê bira çîroka min û Cûno ji vêderê ta bi vêderê ye, hema min ji ew bi vê qefta Xencerê anî ser hev, û gewdê wîna wa li wê newalê ye. Birayê mezin ku Beleko bira ne îro dermanê wî kuştin bû, roja bavê me mir. Cûno çîbû serê girê pêşîya malan. Û Kîrê xwe li bin zikê xwe dixist û digot: Hema bavê we mir ji vî Kîrî ve. Hîna wê çaxê heqê wî kuştin bû bira.

Ji kevnetorê Kurdî  
Danehev û berhevkirin "Serhan Isa"



ولات ( ثقافية . عامة . مسلمة ) . نصف شهرية

welat.press@gmail.com

[www.facebook.com/Dengekurdistanasurya](http://www.facebook.com/Dengekurdistanasurya)

( العدد ٤ ) أيلول 2013